



HDP

BULTENA ÇANDINIYÊ

Şerê Rûsya - Ukraynayê dê Buhayê Xurekan Zêde Bike!

- Di şerê navbera Rûsya-Ukraynayê de herî zêde dê bandorê li ser sektora çandiniyê bike. Li dinyayê îxracata genim a ku di sala 2021'an de 200 milyon ton bû, %30 jê nêzî 60 milyon ton genim ji hêla Rûsya û Ukraynayê ve tê pêşwazîkirin.
- Rûsya û Ukrayna ji aliyekî din ve îxracata tovê gulberojan li dinyayê milyonek û 250 hezar ton ku teqabulî %32 dike, 38 milyon ton ji %19 garis û ji %31 ku 10 milyon û 500 hezar ton ceh îxrac dike.
- Li dinyayê 14 dewlet genimê xwe herî kêr ji %10 ji Ukraynayê distîne. Bi taybetî yek ji welatên Rojhilata Navîn: Lubnan salê pêwîstiya xwe ya genim %50, Libya %43 û Tûnis jî %32 ji Ukraynayê pêşwazî dikan.
- Rûsyaya ku berê xûrek ji derve dikirî di nava 20 salên dawî de bûye aliyê ku difroşe derve, li dinyayê di hilberîna genim de bûye yekemîn. Li gorî rapora 2019'an a malpera daneyên bazirganiyê ya navneteweyî OEC'ê Rûsya bi Ukraynayê re li dinyayê ji çar paran yekê dihilberîne.
- Rûsya, welatê ku herî zêde pê re îcracat û îthalatê dike Tirkîye ye. Li gorî daneyên TUİK'ê hecma bazirganiya ya Tirkîyeyê ku bi Rûsyayê re dike salê 34,7 milyar dolar e, bi Ukraynayê re jî 7,4 milyar dolar, bi tevahî 42,1 milyar dolar e.
- Tirkîye di aliyê berhemên çandiniyê de hatiye asta ku welatê ku herî zêde ji Rûsyayê îthal dike ye. Tirkîye di 2021'an de ji Rûsyayê 4,3 milyar dolar berhemên çandiniyê îthal kiriye. Li gorî daneyên Wezaretê Çandiniyê, Tirkîye di îthalata genim de ji %46,6 ji Rûsyayê û ji %13,4 jî ji Ukraynayê pêşwazî kiriye. Her wiha di îthalata gulberojan de jî ji %65,5 ji Rûsyayê, ji %4,2 jî ji Ukraynayê pêşwazî kiriye,
- Tirkîye di sala 2021'an de ji berdêla 1,8 milyar dolarî ji Rûsyayê 6,7 milyon ton genim, ji berdêla 1,1 milyar dolarî 913 ton rûnê xam ê gulberojan, ji berdêla 309 milyon dolarî 1,2 milyon ton ceh, ji berdêla 235 milyon dolarî 1,1 milyon ton kapek îthal kiriye.
- Tirkîye' di îxracata çandinî û xûrekan de yekemîn e, bi 2,8 milyar dolarî Iraq di rêza duyemîn de ye, bi 1,7 milyar dolarî Almanya û bi 1,6 milyar dolarî Rûsya di rêza sêyemîn de cih digirin.
- Li gorî daneyên Yekitiya Îxracata Sebze û Fêkiyên Hişk ên Akdenîzê, di sala 2021'an de Tirkîye bi berdêla milyarek û 13 milyon dolarî 1,4 ton sebse û fêkiyên hişk ji Rûsyayê îxrac kiriye
- Li gorî daneyên Enstîtuya Lêkolînê ya Aboriya Çandiniya ya Wezaretê Daristan û Çandiniyê di 2020 û 2021'an de Tirkîye îxracata leymûnê ji %25 îxracî Rûsyayê, ji %8 jî îxracî Ukraynayê kiriye, îxracata mewîjan jî ji %55 Rûsyayê, ji %17 jî Ukraynayê kiriye, îxracata mişmişan ji %50, îxracata qeresî ji %32, îxracata çîlekan ji %42, îxracata biyokan ji %28, îxracata hurmiyan ji %38 ji Rûsyayê pêk aniye.



- Di firotina berhemên çandiniyê yê Tirkîyeyê de Rûsya yekemîn e. Ji ber ku Ukrayna di rêza duyemîn de ye, bi şerê di navbera Rûsya û Ukrayna de bandora neyînî li ser bazirganiya Tirkîyeyê dike. Ji ber bandorê li ser bazirganiya berhemên zexîre dike, dibe sedem ku buhayê zexîre zêde bibe.
- Piştî şerê Rusya-Ukrayna, buhayê genim di 14 salên dawî de derket asta herî jor. Ji sedî 7,1 –buha bû. Serê Kileyê (1 Kile beramberî 30 kg) gihiştiye 11,34 dolarî.
- Bi biryarnameya Serokomariyê ya hejmar 5251'an, di îthalat û bazirganiya transît a berhemên çandiniyê ya ji Ukraynayê, mecbûriyeta belge û sertifikaya ku ji aliyê Wezaretê Çandiniyê ve tê xwestin hat rakirin. Bi ve yekê serdestiya zexîre, ewlehiya zexîre û baweriya zexîreyê hatiye rawestandî.

Buhayê zexîreyan her ku diçe zêde dibe!

- Li gorî daneyên Kanûna 2021'ê ya Saziya Îstatîstîkan a Tirkîyeyê (TUİK) û Endeksa Buhayê Endeksa Leçûnê (Tarım-GFE), buhayê lêçûna çandiniyê, di mijdara 2021'ê de salane bi rêjeya ji sedî 36,2, mehane jî bi rêjeya ji sedî 8,52 zêde bû. Di kanûna 2021'an de salane ji sedî 45,6 û mehane jî ji sedî 9,8 zêde bû.
- Li gorî TUİK'ê enflasyona salane ji sedî 54,4 li Gorî ENAG'ê jî, ji sedî 114,87 bilind bûye. Li gorî daneyên TUİK'ê di meha sibatê de Endeksa Buhayê Serfxur (TUFEE) mehane bi rêjeya ji sedî 4,81, Endeksa Buhayê Hilberiner (UFE) mehane bi rêjeya ji sedî 7,22 û salane jî bi rêjeya ji sedî 105,01 zêde bûye. Li gorî ENAG'ê TUFEE mehane ji sedî 5,44, salane ji sedî 123,8 zêde bûye.
- Li gorî daneyên salane yê TUİK'ê ku di sibatê de hatin parvekirin, di nava berhemên ku buhayê wan zêde bûn de rûn ji sedî 140, nok ji sedî 122, nîsk ji sedî 96, meqarna ji sedî 89, hêk ji sedî 84, arvan ji sedî 78, goştê mirîşkan ji sedî 78, sosis & salam ji sedî 64-77, nan ji sedî 62, masî ji sedî 58 goştê dewaran ji sedî 56, zeyt ji sedî 56, rûnê berberojan ji sedî 55, penêr ji sedî 54, şîr ji sedî 52, dims ji sedî 50, şekerê hûr ji sedî 46 buha bû.
- Li gorî daneyên salane yê ku TUİK'ê di meha sibatê de parvekirin, buhayê hin fêkî û sebzeyên ku zêde bûn wiha ne: Kelema reş ji sedî 227, bacan ji sedî 185, dolmîk ji sedî 173, firengî ji sedî 169, tûzik ji sedî 162, kartol ji sedî 152, xiyar ji sedî 151, bexdenûs ji sedî 146, roka ji sedî 140, nane ji sedî 136, spanak ji sedî 135, îsot ji sedî 133, kelem ji sedî 88, gêzer ji sedî 87, xas ji sedî 77, pirase ji sedî 68, tivir ji sedî 72, Hinar ji sedî 71 buha bûn.
- Di sala 2017'an de buhayê kîloya firingî û îsotan 5 TL bû, hêkekê 27 qûriş û lîtreyekê rûn jî bi 5 TL'yî bû, lêçûna menemena 4 kesan 8,5 TL dikir. Di sibata 2022'yan de kîloya firingî û îsotan bi 20 TL, hêkekê 2,5 TL û buhayê lîtreyekê rûn jî bû 28 TL. Lêçûna menemena 4 kesan nêzî 5 qatî zêdetir bû û derket 40 TL'yî.
- Kargeha Berhemên Çandiniyê (TMO) ji bo îhaleya handana yekemîn ya piştî şerê Rûsya-Ukraynayê 435 ton genim, ji bo tona genim jî 420 dolar teklîf (navencî) da. TMO meha borî ji bo tona genim 350 dolar teklîf dabû.
- Hikûmeta AKP'ê bi qanûnên ku ji bo kanan derdixe rê li ber talankirina darên zeytûnan ên ku xwediyê cihekî dîrokî, civakî, çandî û aboriyê ne, dixwe bin xetereyê.
- Li gorî daneyên TUİK'ê di sala 2020'an de destheqê rojane yê karkerên demsalî yê çandiniyê yê ku 106 TL bû ji sedî 20,6 zêdetir bûye û derketiye 127 TL'yî. Mûçeyê karkerên domdar yê çandiniyê di sala 2020'an de 2 hezar û 894 TL bû ev rêje di sala 2021'an de ji sedî 19,5 zêdetir bû û derket 3 hezar û 457 TL'yî



- Rêjeya zêdebûna buhayê hin berhemên demsalî

Berhem Kg	Buhayê Zeviyê	Buhayê Hala Mêrsînê	Buhayê Hala Stenolê	Buhayê serfxur	Buhayê serfxur ê meha borî	Buhayê serfxur ê sala borî
Îsot	1-7 TL	3-15 TL	8-25 TL	17- 40 TL	15-40 TL	8-12 TL
Fireng	1-7 TL	2-13 TL	3-18	12-25 TL	10-22 TL	3-8 TL
Patates	0,25-3 TL	2-5 TL	3-10	7-12 TL	5-10 TL	3-5TL
Pîvaz	0,25-3 TL	1,50 -6 TL	1-4 TL	3-8 TL	2-7 TL	1,50 -4 TL
Bacan	1-5 TL	3-11 TL	10-15 TL	15-20 TL	15-22 TL	5-10 TL
Mûz	2- 7 TL	3 -9 TL	5-10 TL	12-30 TL	13-25 TL	8-15 TL
Pirteqal	0,25- 3 TL	1-5 TL	3-10 TL	5-12 TL	6-13 TL	5-10 TL
Hirmî	1-5 TL	2 -8 TL	5- 15 TL	13-17 TL	2,5-8 TL	8-12 TL

Nîşe: Buhayê berhemên li gorî lêçûna pêvek û qelîteyê wan tê guhertin